Divê mirov hinekî rola Ewrupayê jî veke. Baş tê zanîn ku piştî Erdogan çû Parîsê û hat, her wiha Wezîrê wî yê Karên Derve jî ji seredana Elmanyayê vegiriya, Erdogan rêjeya ragihandina dagîrkirina Efrînê di her xwepêşandan û civînên partiya xwe de wek ferman ragihand. Ev tê wê wateyê ku wan ji Ewrupayê jî destûr wergirtiye. Yekîtiya Ewrupî ya di rêveberiya Elmanyaye de, ji bo rekabeta bi Amerîka û Rûsyayê re hate demezrandin; serê wê jî Elmanya dikişîne. Elmaya ji şerê cîhanê û vir de, xwedana daxwazên kolonî bidestxistinê ye. Elmanyayê berî şerê cîhanê yê yekem hewl da ku bi rêya Tirkiyê xwe bigihîne nefta Kurdistanê. Li gel wê, li ser Îranê re di bin navê lêkolînên zanistî de Oskar Mann tevlî desteyekê şand Kurdistana Rojhilat, li wer li dij Ingîlîzan şazdeh hezar mîlîs organîze kirin, lê bi ser neket. Di vê parvekirina dema me de jî dîsa bi rêya Tirkiyê bi PDKê re têkilî danî, heta alîkariya leşkerî jî da. Lê bi êrîşên hêzên Iraqî û Îranê re deverên herî girîng ji destên rêvebiriya Başûr hatin derxistin. Bêdengiya Amerîkayê, ji alîyekî ve ji ber vê têkiliya Elmanyayê jî bû. Elmanya niha dîsa hewl dide ku vê rêveberiya Erdogan li pê bigire û bi alîkariya wî di nava vê parvekirina Rojhilata Navîn de bibe xwedî gotin. Mirov dikane bibêje Elmanya dîsa li mehîna kulek siwar bûye.

Bi dîtina min; divê mirov mijara Efrînê di vê çarçoveyê de bibîne û binirxîne, da ku bikane van êrîşên dawiyê û lîstikên li ser me û welatê me tên lîstin, dek û dolabên bi bêbextî tên gerandin, hêj baştir têbigihîje.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestvan Ehmed Huseynî: “ Li jiyanê pir zor e ku mirov kurd be, ya jê zortir jî ew e ku mirov helbestvanekî kurd be”

Ehmed Huseynî, bi reng û şêwazê xwe yê dilkêş, cihekî berz û bilind di qada wêjeya kurdî de ava kiriye.
Bi hostayî û ji alavên ku di malzaroka çanda kurdî de hatine daritştin, hestên xwe li ser pelê û di malikên helbestê de vedibêje. Ne tenê ji nifşên îroj re dinivîse, lê xwe noqî deryaya raz û nepenên kurmanciyê dike û di nêçîra xwe de dur û laleyên hêja ji nifşên li pê xwe re dihêle.
Di sala 1955’ê de li Amûda Rojavayê Kurdistanê hatiye dunyayê. Qonaxên pêşîn ji xwendina xwe li Amûdê qendandiye, paşê li Şama Paytext Beşa Felsefeyê temam kiriye. Dixwest ku di xwendina xwe de bigihêje astên bilind, lê Hikûmeta Sûriyeyê rê li ber girt. Ji lew re di 1989’ê de berê xwe da Swêdê û herî dawî jî li Îngilistanê bi cih bû.
Di geşta nivîskariya xwe de bi dehan ji niviştên hêja berhem dane. Jê û pê ve, Huseynî ji 2001’ê ve tevlî kenalên kurdî yên wekî Medya û Roj TV bûye û ji 2013’ê ve di Ronahî TV de bernameyekê pêşkêş dike.
Aniha xerîkî xebat û çalakiyên rewşenbîrî li Rojavayê Kurdistanê bûye û li ser derxistina kovareke bi navê “Mîştax” dixebite.
Çawa ku nivîsa wî bala mirov dikişîne, wisa jî hêçan, nirxandin û şîroveyên wî hêja û bilind in.
Di evê hevpeyvînê de, çend hevok û ravekirinên xweş bixwînin.

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtanî

-Dixwazim ji pirseke giştî hevpeyvîn û suhbeta xwe bidim destpêkirin. Eger em rewşa xwe ya çandî û wêjeyî bi pêşveçûn û nûjeniya demê re bipîvin, di demekê de ku derfeta tevgerîn û lêgerînê hêsan bûye, em li kû ne?

Serê pêşîn, zevtkirina dîmen pêwîst e. Di zevtkirina ewî dîmenî de hişmendî û hişyariyeke ku bikaribe xwe bixwîne, derbasî kûrahiya pirsgirêkê bibe, pirsgirêkê zevt bike, goşeyên tarî ruhnî bike, kêlîkên şikestinê destnîşan bike; da ku li gorî wê em zanibin em kî ne? Em ji kû hatine û bi kû ve diçin?

Gava herî pêşîn ku colonialismê pêk tîne: Şikandina derzika piştê ye.

Derzika piştê: bermahiya dîrokê, kelepûr, ziman û bîra gelemper e. Serdest dixwaze ku li şûna evê paşxaneya çandî, çanda xwe li ser bindestê xwe bisepîne. Di vê pirsa pişaftinê de, derba herî mezin li zimên dikeve. Gava ku em dîmenê xwe li pêş çavan raxin û bixwînin, em ê bibînin ku alava me ya xwenasîn û danasînê (ZIMAN) derbeke mezin xwariye. Kurd hînî 3 zimanan bûne. Di wê hînbûnê de qurbaniya herî mezin hest e. Dema ku zimanê serdest bigihe asta ku miletê bindest pê hest bike, wê hingê colonialism û dagirkerî gihan serencama xwe.

Di van 30 salên dawî de pirsa dabiranê hat çareserkirin. Lê pêwîstiya kurdan bi nasnameyeke siyasî heye, hetanî ku karibin zimanê xwe azad bikin.

Îcar divê bi awayekî jixweber em xwe perwerde bikin. Divê ku em di mejî û canê xwe de çand, kultûr û perwerdehiya erebî bi dûr bixînin û li şûna wê mîratekî xwerû kurdî biçînin.

Derba herî dijwar me di rihê xwe de xwariye. Diziya herî mezin di çand û hunera me de çêbûye. Ji 5saliya me ve em avêtin wanexaneyan, bi zora dar û lêdanê em zuha kirin û berê me dan zimanekî din.

Eger wê demê kurd bibêjin ku Ehmed Huseynî ji tevahiya berhemên xwe tenê helbestek bi kurdiyeke resen û petî nivîsiye, ji bo min serkeftin e

-Bang an jî daxwaza hewldana zevtkirina reh, damar, raz û nepenîyên zimên her timî di axaftin û nivîsên te de berz e. Ev zevtkirin bi çi hawî pêk tê û eger pêk hat, meriv dikare çi binivîse?

Ji derveyî her tiştî, lê evên ku bi vê pirsê mijûl dibin şahidên gelek bûyer, trajedî, êş û azaran in. Ew jî bi mebesta zevtkirina kêlîka afirandinê, da ku meriv bikaribe ewê êşê bi awayekî bejinbilindane binivîse.

Heçî nivîskar û rewşenbîr e, erka wî parastina nirxên civakê ye. Divê ku nivîskar bi rengekî cihê û bi şêwazekî ciyawaz ji ziman nêzîk bibe, hetanî ku bikaribe nasnameya “nivîskar” bi dest bixe. Dema ku ez nikaribim Ş.Avesta di peyvê de vejînim, pêwîst nake ku ez binivîsim.

Nifşek wê bê ku ji bandora zimanê serdest rizgar bûye. Dê ev berhemên me bi dest wan nifşan bikevin û dê bi hestên zelal ên kurdî bixwînin. Pirs ew e: Gelo dê ev nifş tu sûdê ji van berhemên me bigire ku xwe pê dewlemend bike?

Eger rojekê ji rojan Kurdistanek ava bibe, eger rojekê ji rojan zimanê kurdî azad bibe, eger rojekê ji rojan nifşekî ku bi kurdî mezin bûye û bi kurdî hest dike peyda bibe, eger wê demê kurd bibêjin ku Ehmed Huseynî ji tevahiya berhemên xwe tenê helbestek bi kurdiyeke resen û petî nivîsiye, ji bo min serkeftin e.

Kurd hebûneke dijawr e, pirseke giran e, pênaseyeke tirsnak e, êşeke piralî ye

-Barê helbestvanê miletekî bindest ji barê helbestvanê miletekî serdest girantir e?

Li jiyanê pir zor e ku mirov kurd be, ya jê zortir jî ew e ku mirov helbestvanekî kurd be. Kurd hebûneke dijawr e, pirseke giran e, pênaseyeke tirsnak e, êşeke piralî ye. Mînaka wê tune.

Lê çi li vir heye, yên ku hatin û em bindest kirin, armanca wan daqurtandina me bû. Ev zimanê ku em li ser diaxivin bi dehên kefenan çirandine hetanî ku gihaye me. Ji lew re, divê em pir lê miqate bin û wî delalî bikin; nav tê bidin, da ku ji xwe bawer be. Ziman bûnewerek e; nexweş dikeve, zuha dibe, dimire...



Çendîn em bikaribin bi berpirsyarî û bi baldarî nêzîkî ziman bibin, ew qasî baştir e.

-Di roja îroyîn de û piştî ku kurteçîrok û roman ber bi jorê ve baş hevraz bûne, gelo helbest ji lutkeyê berjêr nebûye?

Te gotina helbestvanekî îtalî anî bîra min; dibêj: Hemî babet, xwendevanên wê kêm bûne, lê ew xwendevanên kêm ên helbestê ji wan kêmên celebên din zêdetir in.

Vedîtina şêwazê Selîm Berekat di nivîsînê de, ez ber bi nivîsînê ve kêşam...

-Di biwara nivîsîna helbesta nûjen de, cenabê te li nava tevahiya kurdan naskirî ye. Geşta te ya helbestnivîsînê kengê û çawa dest pê kir?

Di salên 1980 – 1981’ê de birayê min sitranbêj bû û min jî helbest ji bo sitranên wî dinivîsîn. Lê paşê di 1983’yê de êrîşeke tirkan li ser devera Hekarîyê çêbû, wê hingê ew cara pêşîn bû ku tiştek çirusî û di wê bûyerê de min helbestek bi navê “Bûka Êgir” hûna. Jixwe wekî din jî tevahiya malbatê dinivîsî û yê herî zêde jî helbest ji min re dixwendin “Mihemed Nûr Hunseynî” bû.

Min bi navê “Ehmed Ciwanko” bi erebî jî dinivîsî. Bandora kurdiyê li ser min bi xwendina du berheman çêbû: Yek jê berhema Rojan Bernas û yek jî berhema Ebdurehmanê Mizûrî bû. Dema min ev herdu berhem xwendin, min ji xwe re got ku bi kurdî jî helbestên xweş tên nivîsîn.

Ji aliyekî din ve du hevalên min hebûn, herdu jî bi êgir şewitîn û ji jiyanê bar kirin, ew jî “Kesrayê Ebdê” û “Fesîhê Seyda” bûn. Belku ya min, wekî tolhildana her duyan ji helbestê bû.

Ev qas atmosfer û bûyerên ku rûdan, paşê jî vedîtina şêwazê Selîm Berekat di nivîsînê de, ez ber bi nivîsînê ve kêşam...

Xala herî girîng jî ew e ku ez derdora du sal û şeş mehan li kampeke Swêdê mam. Rewşa min a derûnî pir xirab bû û ji xwendinê pê ve tiştekî din bi min re nedibû alîkar. Ez çûm Stockholmê bal dostê xwe “Zinarê Xamo”. Zinar tûrikekî pir mezin tije pirtûk kir û da min. Min bi yek carê xwe ji xwendina kurmanciyê re vala kir.

-”Sîsirkê Hesinî” berhemeke Selîm Berekat e ku te wergerandiye zimanê kurdî. Di pêşgotina wegera xwe de, te Selîm Berekat bi gotinên xweş nimandiye. Tu kesayeta Selîm Berkat çawa dinirxînî û çawa şîrove dikî?

Bi kurtasî dikarim bibêjim ku gerek e Selîm Berekat sihirbaz bûya. Kêfa wî bi xwe jî ji tiştên wisa re tê. Tişta wî ya pir balkêş jî ew e ku danûstandina wî bi nivîsînê re û ew atmosfera ku dikeviyê, pir xeter e.

Ez bawer nakim ku di babeta nivîsînê de mînaka wî hebe. Ev heye 30 sal ku tenê di danê êvarê de ji se’et 7 hetanî 8 dinivîse. Ya din jî berhemên ku dê bandorê li ziman û xeyala wî bikin, qet wan naxwîne.

-Weku HRRKê, projeyeke we ji bo derxistina kovarekê hebû. Kengê kovara we derdikeve û eger derket, dê çi tiştên nû vehewîne?

Em li benda navendê bûn ku avakirina wê bi dawî bibe, da ku em bi awayekî fermî vekirina wê ragihînin. Lê ji ber rewşa Efrînê me ev yek munasib nedît û yekser me dest bi kar kir. Beşê kurdî weku mijar amade ye û aniha xebat li ser beşê erebî tê kirin.

-Di civata nivîskarên Rojavayê Kurdistanê de, dengê gilî û gazindan gelekî bilind e. Ji bo nivîskarekî, tu gazind an jî behaneyan çawa dibînî?

Ji bo min, ez 26 salan li derveyî welêt mam. Dema ku welat dihat bîra min, tenê darbest û kefen dihatin ber çavên min. Min digot ancex ez cendekekî mirî li welêt vegerim. Kêlîka Rojava, bûnewerekî nû di hundirê min de diafirîne. Ji derveyî ku ziman mala min a hebûnê ye, Rojavaya rasteqîn a min bêriya wê dikir, tirbên ku min bêriya wan kiribû, miriyên ku min ew nedîtin û mirin...ev tiştên ku min rêz kirin, hiştin ku ev kêlîk ji bo min bibe kêliyeke berpirsane.

Kî çi dibêje bila bibêje. Ev Rojava ya min e. Berî ku ya kesî be, ya min e. Çenkî ez ê bikaribim bi şêwazekî xweşik danûsatandinê bi vê Rojavayê re bikim.

Paşxaneya ewî rewşenbîrî çi be, bila bibe. Lê hindek pirsên Rojava hene divê ku em bersiva wan bidin û çu îşê tu partiyan jê tune. Eger pirsên ziman bin, eger pirsên hebûnê bin, eger pirsên çarenûsa nasnameyê bin, bersivên wan her ji me tên xwestin.

Em ê çawa bikaribin ji derveyî gazind, serhevde, devaêtin û xeberan vê pênaseyê biçesipînin? Em ê çawa bikaribin ji rewşenbîrê kurd re bibêjin ku bila tu girêdayî çand û wijdana civaka xwe bî?

Em ê çawa bikaribin ji rewşenbîrê kurd re bibêjin ku ji tu partiyan re nebe terî; bila ew bên bejna xwe li ber te biçemînin û hurmeta te bigirin..?

Mixabin, xeleka ku ez ê çawa bikaribim vê kesayetê biafirînim, li bal me winda ye.

Di vê gazind û xirecira xwe de, êdî em wê pênaseyê bi carekê re winda dikin.

-Herî zêde tu nivîs û berhemên kê dixwînî?

Herî dawî, çavên min li nivîsên Rênas Jiyan in.

-Helbest ji bo te çi ye?

Jiyanê watedar dike.

-Gotina herî xweş?

Evîn e.

-Gotina herî ne xweş?

Xiyanet e.

-Tu li çi poşman bûyî?

Di jiyanê de hevaltiya çend kesan.

-Qehremanê te kî ye?

Masiyê Helîm Yûsiv e.

-Bi yek hevokê, kesayeta xwe vebêje?

Helbestvanekî ku xwest peyama xwe bigihîne, pir êşiya, lê hinekî zû xwe nas kir.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Çiyayê Kurmênc

Merwa Birîm

Gava sal bi xemsarî gavan li ser rêya koçkirinê diavêje û mehan ji tûrikê xwe dadiweşîne, wê demê kulîlkên Newrozê di meha BEFANBARê de rikberî demsalan dibin û di dilê kurdan de dîrokê vedijînin; reng, destan didin hev û dîlana azadiyê gumreh dibe…

Lê îsal ne wekî her sal e, ji ber ku dijminê devbixwîn destên xwe yên biqirêj avêtin pîrozgeha zeytûnan, wargehê giwêj û kezwanan.

BEFANBARa îsal piştî ku bîst roj bi xemgînî pev deziyê demê kir, dagikeran hêrîşî buhişta Kurdistanê kir. Lê ew rastî berxwedaneke dîrokî hatin, hêviyên wan mîna teneke nok rastî zinarên çiyayê KURMÊNC hatin, perçe perçe bûn. Nemaze wan li aliyê Tirkiyê penageheke ji 31 hezar konî amede kiribû ku gelê Efrînê di bin de bi cî bibe… Bajarê Efrînê gelê xwe hembêz kir, radestî dijminan nekir, kêlek dane kêlekan.

Vê yekê tiştek teqez kir û anî bîra min, ew jî ku bingeha civaka kurdî evîn e. Ji mêj de xaniyên kevnar li herêma Efrînê yên bi navê "Xaniyên Qentirme" tên naskirin, dibûn hembêzeke evînî û bi dehan kes di nava dîwarên xwe de xwedî dikirin.

Efrîn îro xaniyê qentirme ye, gelê xwe ji mişextiyê diparêze. Bê gotin û bê bang, hemû alîkariya hev dikin. Ev jî pêwîstiyeke qonaxî dide xuyan ku kilîtê yekbûnê li gel gelê kurd amede ye.

Xwendevanên hêja:

Li roja sersalê bi boneyekê min seredana çiyayê KURMÊNC kir, ji ber ku li wan sirtan ji dayîk bûme. Min xwe da kalemêrekî ku bi gopalê xwe lêdanên xaknîgariyê dijmartin, roj li piskulkê kum baniyabû, min ji xwe re got:

Ev gelê bi rojê re têkildar, bi sîkan qayîl nabe.

Û ev kalemêrê ku birûskan di çavên xwe de kedî dike, di terazûya wî de jiyan û mirin li vir xweş in. Bê guman kêmhiş e yê ku hêlûna wî vepincire, aramiyekê xwe di riwê min de çand, ez di ber darçinara çateriya gundê me re derbas bûm. Dîrokê li koka xwe alandibû soza vegera Buharê da min û got:

Çiyayê KURMÊNC e keça min. Îsal Agirê Newrozê di bin berfê de serkeftinê dilîlîne. Bi xem mebe, roj jî li vir vedipeke.

Nivîsên ku di Bûyerpressê de tên çapkirin, nerînên xudanên xwe ne.

Bang Bo Romantîkiyê
Nameya Duwem: Doza Me Pîroz e…Bêhempa ye

Azad..A.Z.X

Doza me pîroz e, bêhempa ye. Ji mêj ve ye ku vê dozê li ber xwe daye, xwe ragirtiye. Li ser gelek serdeman re bûriye, derbasî roja me ya îroj bûye. Ne kêm bûye ne jî lawaz bûye, her demî bi hêz û mezin bûye. Kurdên welatparêz, berxwedêr û cangorî ev doz parastine; kirine armanc û hêvî, sipartine dil, can û hestên me.

Ev doza mirovahiya me ye, narvîna hebûna me ye, ronahiya çarenûsa me ye. Em xwedî maf in, ev doza pîroz a pakrewan, şehîd û cangoriyên vî welatî ne. Hem bi saya hezarên şoreş, berxwedan û serhildanan, hem jî bi xwîna şehîd û cangoriyan hatiye parastin.

Ev doz hêrs dibe, dibe hêz li ber xwe dide, dibe volqan, difûre, diteqe, dibe şoreş û berxwedan rûdide. Her demî dibe serhildan û peyv û gotin, ji nedad û sitemkariyê re dibêje: Na na.

Ev doz hêjayî berxwedanê ye, bi vîna azad ji dil û can... Ev doza pîroz gewherê mirovahiya te ye û sembola dilsoziya te ye, ey kurdê berxwedêr û welatparêz! Serbilind bibin bi vê dozê, ji ber ku em aştîxwaz in, ne wekî dijminên welat û vê dozê hov in.

Heger hûn ne dilsozên xak û welatê xwe bin, hûn ê nikaribin bibin xwediyên vê dozê. Heger hûn bi vê dozê, ne şanaz bin, mirovahiya we yê ne azad, sivik û nizim bimîne. Ev doza pîroz tenê dikeve nav dil û hestên pak, soz û ronak. Ev doz nayê kirîn û firotin. Bizanibin dema we xwe firot, ev doz bi we re nayê firotin. Lê dema we ji welat bar kir û hûn koçber bûn bi vîna xwe, ev doz li welat dimîne, bi we re ti carî koçber û xweperest nabe, bi rê nakeve.

Ev doza jiyaneke bi rûmet û azadî ye, napejirîne sitemkarî, zordarî, koletî û bindestî. Ev doz wêrîna qehremaniyê ye.

Nimûne: Ev doza çiyayên Ararat û Zagros e; Toros, Çiyayê Kurmênc û Cûdî ye. Dicle, Zab û Ferat e. Xak û dar û av in, Kurd in, mirov in. Ev doz welat e.

Ev doza Mehabad û Agirî ye, Dêrsim û Amed e, Şingal û Helapçe ye. Koban û niha Efrîn e.

Dîrok: 2018/1/20_21_22_23.... Oy Efrîn, te dil û can dişewitandin. Efrînê, delalê, şîrînê! Hêlîna hêmin, bajarê pîroz, nazdara dilên kurdan, hembêzgeha darên zeytûnan. Tu welatparêz î, mirovperwer î, kurdewar î. Te ev doza pîroz hembêz dikir. Dijminên hov û sitemkar êrîşî te kirin û dikin, ji jor û hawîrdor.

Li te didin top û gulleyên zordarî, ji bêdadî û nemirovahî, ji kîna dijminkarî.

Ey Efrîna serbilind û rûmetdar, tu ne bi tenê yî. Birîna te mirovahiya kurdan birîndar dikir û dike. Berxwedana te, Kurdistan dihejand. Berxwedana te romantîkî ye. Herêma te romantîkî ye. Min bawerî bi serkeftina te heye, sitemkarî dê nikaribe zora mafdariya te bibe. Tu yê rahêjî sembola azadiyê û bilind bikî. Ev doz Kurdistan e.

Ey doza welatê min, ez te bi evîna xwe pîrozî dikim û te di nava dil û canê xwe de hembêz dikim. Te datînim li hemberî rojê, tu şewqan vedidî, roniyê didî li ser alayê bi rengîn diçirûsî. Tu gewher û zêrên sermedî yî, te datînim li pêşiya hemî hêviyan, hêvîdar im tu yê bibî serkeftin, bigihêjî serxwebûn û azadiyê...

Ey Xweda, welatê min biparêze. Dozdarên gelê min di dema li ber xwe didin û xwe diparêzin de, xwedî maf in. Em aştîxwaz in, ne wekî dijmin şerxwaz in. Ev doza me bi dad û mafdar e, hebûna me bi welatê me, azad û serbilind û bihadar e.

Ey Xwedanê şev û roj, me bawerî bi te heye. Em sipasdar in, em bûne xwediyên vê doza pîroz a mirovahî. Mirovahiya me bi pak û mezinbûna te bilind û bihadar e. Ev mirovahiya me bi zanîn û rawişta Zeradeşt, durist û parastî maye.

Ey Xwedayê Mihrevan, ji bo Xatirê Giyanê Pîroz (Yesûi Mesîh) evê dozê biparêze, bilind bike jor û bigihîne serkeftin û azadiyê. Alîkariya me bike, em bi tenê ne. Welatê me, mirovên me, li hêviya Mihrevaniya Te ne. Em pêwîstdarên Mehdera Yesûi Mesîh in.

Bang bo doza me romantîkî ye.

Mafê Mela Ehmedê Namî

Da Ku Nivîskar û Helbestvanê Kurd Mele Ehmedê Namî ji Mafê Xwe bêpar Nemîne, Ez Vê Gotarê Pêşkêş Dikim:

Gelek caran ez gotar, lêkolîn û hevpeyvînên nivîskarên kurd ên di malperan de tên weşandin (Nemaza yên di warê toreya kurdî de) dixwînim.

Rojekê, li gerekê di nava malperan de, ez pêrgî hevpeyvîna bi nivîskarekî bi nav û deng re, hatim.

Min hevpeyvîn bi germî xwend. Mixabin xwendina wê ne tenê ez tengijandim, lê belê ez li vê yekê hişyar kirim.

Gelo Çi Bû?

Nivîskar di hevpeyvînê de, helbesvanên helbesta klasîk û nivîskarên kurd ên nifşê berê ku li Rojavayê Kurdistanê jiyabûn, di nivîsa xwe de wiha wan bi nav dike û dibêje:

"Wek: Dîwanên Cegerxwîn û Osman Sebrî û kesên ko dane ser şopa wan wek: Seydayê Tîrêj, Yûsivê Berazî, Omerê Lealê, Mele Nûriyê Hesarî, Seydayê Palo û Keleş…"

Mixabin nivîskarê me, Namî ji nava karwanê van helbestvanan bi dûr dike û wî wek helbestvanekî wê demê nabîne.

De ka werin em ji xwe û ji nivîskarê xwe bipirsin:

Gelo Mela Ehmedê Namî bi helbestên xwe yên klasîk û dîwana helbestan a bi navê DAXWAZNAME, ji wan helbestvanan nayê jimartin?

Gelo Namî bi nivîsandin, çapkirin û weşandina pirtûka AGIRÊ SÎNEMA AMÛDÊ, ku ew serpêhatiya xemgîn ji windabûnê parast û ta roja îro kurdên Kurdistanê nifş li pey nifş bi wê serpêhatiyê agahdar dibe û wê bi bîr tîne, nabe nivîskar?

Gelo helbestvanê me, nivîsên Seydayê Namî di nava rûpelên zêrîn ên Kovara Hawar û Ronahî de nexwendine?

Namî di kovara Ronahî ya ku Mîr Celadet Alî Bedirxan li Şamê diweşand de, gotarek bi navê Mehkema Hawarê û Deyndarê Şermende de dibêje: "Ez kurek ji kurên Hawarê dihatim hesab kirin û min xizmetên gelekî mezin jê re kiri bûn."

De ka em bibînin bê ev şahidên rastgo der heqê Namî de çi dibêjin:

-Profîsor Celîlê Celîl di seredana bajarê Qamişlo de û di nava civateke xortên bajêr de, di warê toreya kurdî de dipeyivî. Dema ku gotin hate ser pirtûka Agirê Sînema Amûdê ya bi pênûsa Mela Ehmedê Namî hatiye nivîsîn, wiha got:

"Dema min pirtûka Namî 'Agirê Sînema Amûdê' xwend, Namî bi wê serpêhatiyê û rengê nivîsîna wê ez girîyandim."

Ji nameyên ku di bîranînên koça dawîn a Namî de hatibûn hinartin:

-Prof.Ordîxanê Celîl:

"Ji min re hurmeteke pir bilinde, ko îro ez bîranîna Mele Ehmedê

Namî roja 25 saliya koçkirina wî ji gelê xwe re didme xuya."

-Rezoyê Osê:

"Namî di helbestên xwe de, sipartiye ristên awazdar û kêşesaz, şêweyê wî taybetmendiyekê dide rist û bexşaneya wî."

-Ehmed Huseynî:

"De bila Sorgulek bo nexşeya xewnê be.

De bila sorgulek jî ji bo herikîna sirûdê be Seyda." Kovara Dugir - Swêd

-PENa KURD – Elmanya:

"Bîranîna koçkirina rewşenbîrekî di giraniya Seydayê Namî de ne dana mafê wî ye, lê belê gaveke di rêka danê de ye."

-Nivîskar Firat Cewherî:

"Seydayê Namî jî li gora serdê welatê me û li gora dema xwe rewşenbîrekî me yê bijartî bû".

-Bîranîna Namî, piştî 20 salan li Qamişlo zindî dibe:

Bîranîn jî kar û barê reşenbîran bû û bi hiş û hunerên wan bû û di bin sîmbola "Bila Bîranîna Namî bibe sîmbola rewşenbîriyê" hatibû neqişandin.

Nivîskar Konê Reş di nameya xwe de, ya ku ji "Yûbîla Zîvîn ya Bîranîna Seyda Mele Ehmedê Namî" re hinartibû, dibêje:

"Dema ko mirov Mela Ehmedê Namî bi bîr tîne an li ser di axife, derhal pirtûka wî (Agirê Sînema Amûdê) û sirûda wî:

Pêşkevin em serfirazin miletê kurdî

Yan mirin em dê bibînin yan jîna kurdî

Têne hiş û bîra mirov û pêre pêre jî hevalên wî wekî Cegerxwînê Hesarî, Osman Sebrî, Qedrîcan, Mela Abduselam Nacî, Mela Ehmed Zivingî, Mela Ehmedê Palo, Ehmed Nafiz Zaza û gelekên din….

Mela Ehmedê Namî, yek ji wan mirovan bû, ewên ko her dem û gav bi kul û êş û janên gelê xwe re girêdayî bû, bi refê pêşengên gelê kurd re bû, ew refê ko bingehê rewşenbîriya kurdî li sûriyê danîn…".

Gelo ma van birêzan gotinên xwe ne li gor bîr û baweriyên xwe gotine?

Belku gelek caran û di gelek nivîsên nivîskarên bi zimanê kurdî de jî, eger nivîs di warê helbestê de be, nivîskar navên helbestvanên wekî: Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrîcan, Tîrêj, Keleş… rêz dikin û di dawiya rêzkirina wan navan de dibêjin: "Û hinên din…"

Û eger nivîs bi zimanê Erebî be, dibêjin: "و غیر هم "

Ne tenê di nivîsekê de, lê di gelek nivîsan de ev yek dubare dibe.

Her û her Seydayê Namî û hin nivîskar û helbestvanên mîna wî yên wekî: Hesen Hişyar, Mela Elîyê Topiz, Mela Ehmedê Zivingî, Mela Ebdilselam Nacî Cizîrî… tên jibîrkirin.

Nivîskarekî din, di bernameyeke rewşenbîrî de ku navê wê "Rengê Rojava" bû û di Kurdistan TV de dihat weşandin(2013.04.28), navên hin rewşenbîrên wekî: Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrîcan û Selîm Berekat...bi lêv kir (Ev ji mafê wan ê xuristî ye). Ma qey ne ji mafê Namî ye ku ew jî yek ji rewşenbîrên wê demê bê binavkirin.

Samîyê Mele Ehmedê Namî

Destxwşî ji her nivîskarekî re, ku di roja îroj de rûmetekê ji welatparêz, xebatkar, ronakbîr û rewşenbîrên gelê xwe re li gor kar û xebata wan a binirx bigire. Ew jî ne minetek e, lê belê ew ji mafê wan ê xuristî ye.

Nivîskar, ronakbîrê miletê xwe ye. Jê tê xwestin û li gor wê rûmeta ku milet jê re digire ku hinekî bi ujdan be û mafê tu kesî nequrmiçîne.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Pexşanên Bijartî...Evdo Şêxo

Pêşangeha Çekan

Gule:
Tijî nifir im. Min bejnek anî xwarê.
Dema agir û barûd têne pêşberî hev.
Dema bêhna barûdê dikeve pozê zikreşîyê; daraz daraza birûska dengê min e.
Nexwe bila her kes di gurimtîyê de biçe.
* * *
Kalaşnîkof:
Rûyê mirinê me.
Navê min ew çend giran e, ji navê jîyanê bêhtir tême nasîn, ji navê merivantîyê bêhtir tême bilêvkirin.
Li jêr tîrêjên tava Tebaxî, kela min radibe, agir bi canê min dikeve; hesin bi sarî dicûm. Mîrata guleyê didim ber nikilê xwe yê dirêjik û jîyanekê didim ber bayê ramûsana dawî.
* * *
Nîşangir:
Teq: Çêja kiloxê kalemêrekî rûgewr fûrîya.
Teq: Naznazokek ji destê bêrîvanekê hilweşîya.
Teq: Xewna nûciwanekî herifî.
* * *
DŞK:
Te got guleyên dendikpola?
Hesin û hesin reqandiye hev.
Qarqara kuştinê esman qul kiriye û gorê guhên xwe li ber bel kirine.
* * *
Tank:
Hirça hesinî bi serê pozê xwe yê hildayî li qelsîyê dinêre.
Toqa şeytên li stûyê bajêr bûye û semaya gurmegurmê digerîne.
Di sahîya jîyanê de, birûska xwe li nehtika hedarîyê dixe.
* * *
Mayîn:
Mirin di zikê erdê de nivistiye.
Mirinê mitêla gîyayê hêşîn kişandiye ser kelaşê xwe yê sar.
Mirin li bende pêyên bêguneh e ku wan biçine.
Mirin li bende seyrana ker û lal e.
Mirin ketiye temarê; jîyanê xirpiş kir; berê spêdeyê gewr bû û govend giran bû.
* * *
Top û Bombe:
Du tacêwîyên xwînsar; ji pincara heman çîyayê bêxêr.
Du hemwarên ku di hundirê hev de kişkişîne, ketine kirasê hev.
Du mişkên heram bi şeytên re kirîvatî danîye.
* * *
Balafira Şer:
Di ser xwe re kesî nabîne; hevrêya Xwedê ye ew.
Di xwe de werimîye û her tişt li jêr wê ne tu tişt e.
Firinkên xwe hildane ber perên esmên û bûye fûrînîya hespê boz.
* * *
Sînor:
Ruhkişîn; ji roja ku tu çêbûyî, lingên me her dem li hafa gorê ne.

Evdo Şêxo: Di sala 1987'ê de li bajarê Qamişloyê yê Rojavayê Kurdistanê ji dayîk bûye.
Xwendekarê Mafnasîyê yê Zanîngeha Şamê ye. Ji sala 2010'ê ve dest bi karê wergerê kiriye û heta nuha heft berhem ji Erebîyê wergerandine Kurdîyê.
Sernivîskarê beşê Kurdî yê Kovara Sormeyê ya çandî ye û her weha yek ji damezrînerên Projeya HINARê ya Çandî bû. Nuha li Qamişloyê dijî û bi karûbarên çandî mijûl dibe.
Ji bilî her heft wergerên wî, tenê berhemeke wî ya nivîsên pexşanî bi navê "Boxeyê Birîvayê" heye.



Cinyaz

Xwedê kurê newekhevîyê ye.
Heger dadmendî hebûya, dê tu pêdivî bi Xwedê tunebûya.
Ez term im, te go erê?
Geh li hafa rêyê, bêxwedî, beravêtî.
Geh li naverasta mizgeftê, di nava tofana serbilindî û girînê de, li ber pêla qelebalixa dojehîn, li ber lehîya lîlandina ji hinavên hevxwarî derhatiye.
* * *
Ez term im, te go erê?
Geh li jêr daraza guleyê; kela pîşoyê canê min dibişêve.
Geh li ber perên Ava Har; nikarim binax bibim.
* * *
Ez term im, te go erê?
Li ber Birca Belek, gulîyeke bêxwedî ya dareke hilkirî; reh û rîşalên hişkmayî.
Keçeke xama me di sarinceke germ de. Rapêçandî me bi çarşeva spî ya destkarîya yadê. Laş bi têza guleyê germ e, dil bi maşandina dadê sar e: Dayîk li ber hêtê sarincê dilûbîne, ava derdên bêderman di nava qûşxaneya bindestîyê de dikelîne. Dayê! Bêhna xwarina destê te ji dilikê sarincê tê, bêhna apraxên te barûda guleyê dibihujîne. Qey te destên xwe bi hine kiribûn berî pehtinê? Bêhna hineya te cinyazê min dagir kiriye.
* * *
Ez term im, te go erê?
Geh li ber minaroka çarxencerî. Çar şûrên li çar parçeyên laşê min ê sêwî rakişandî. Çar singên di kezeba min de kutayî. Çar kekên bi xencera biratîyê xwînî. Çar çokên li ber bayê kur ê rajêrîyê sistbûyî.
* * *
Ez term im, te go erê?
Geh nûzayeke pitik im. Agir rûyê min vegemirandiye. Mirinê xwe li kelê jîyana min a kurt daye. Awirên dayîkê dadixwim; li ber lasera awirên keserkûr û şikestî, gîyanekî çîz û reben im.
* * *
Ez term im, te go erê?
Çend segên har li raserî cendekê min ê şûtîtazî rawestîyane; awirên xwe yên tolaz kutane nexşeya laş min ê Cizîrî yê ter û bêcan. Roka jixwenebawer a Sibatoka Dîn, xetên zikê min ê gewrîboz dane ber tîrêjên xwe yên şermok; wekî ku awirên rokê bi awirên rokê biterpilin. Bedena bûkeke serbixêlî li jêr sîya destdirêjîya xûynepakîyê.
* * *
Ez term im, te go erê?
Geh sî û çar dilopên ku ji banê çîyayê qaçax niqutîne. Hatine koka min û zikê min ê birçî. Kok li dilê min anîye parîyê bi riswatî. Kok li hêvîyên min danîye. Koka xwezîya heyatê li min hatiye birîn.
* * *
Ez term im, te go erê?
Dayîkeke bi kirasekî gulgulî, bi şareke hur-Kurmancî, di nava gola xwîneke hur-Şirnexî de vegevizandî me. Canê min merhebetî ji jîyanê birîye û gîyan li bende hebûnê spîsax e.
* * *
Ez term im, te go erê?
Li hawirdorê girên Binxetê yên di çala dîroka nepen de werbûyî, li rasta rêya bîrwerîya min a kevzgirtî, ha li jêr temenê min ê tarûmarbûyî, li raserî bejnaferîya welêt; termekî rîhanî yê di xwîneloka temenên tevizî de noqbûyî me, jînenîgarîya min dane ber xêz û çixêzên sorsorikî; termekî soryazî, beybûnî û suryalî me, wekî xewneke ku ji xwe têr nebûye.
* * *
Ez term im, te go erê?
Li ber girê Asûrî, bejna Demhatê govendgêr im, semaya şervanîya çîyê, dîlana qidûmşikestî. Çavên mirinê li dora mêrxasîya min dilalijin.
* * *
Ez term im, te go erê?
Termekî jibîrbûyî li lûtkeya çîyayên seqemgirtî. Agirekî geş im û min xwe li berfê pêçaye. Li ber nazûnûzîya mirinê, tingetinga têlên tembûreke jihişveçûyî tê; dîlaneke bicizbêketî. Ew dîlana saza min e, heftrengîya dengê min e, keftelefta tilîyên min e, erênaya gîyanê min e.
Nav li min kirine mêrxas; Derîyên Dawetîyan bejna min hilnagire.
Mirinê wekî şilfa şûr, canê min ji dinyayayê hilqetandiye.
* * *
Ez term im, te go erê?
Ew termê sêwî; ew termê ku welat li dû xwe kaş kir. Cendek li rasta rêyê, werîsê serdestîyê pehnîya min a bindest bend kiriye û dûpişka hesinî qirêja kolanê bi pakîya min paqij dike.
* * *
Ez term im, te go erê?
Gunehê min ew e ku ez hîn li xewnereşka bindestîyê nebanîyame.

Boxeyê Birîvayê

Hin kes dibêjin jîyê delal û şîrîn. Hin dibêjin jîyana di deryaya hingivekî Şemzînanî de nûqbûyî; wekî helawa Dîlokê şîrîn. Hin dibêjin fena berfedimsa çilê zivistaneke harhare. "Waxxxxx! Çi xweş e ev heyat!" Hin weha diqîrin.
Lê ez Evdile -serekê mêran- min çi dîtiye ku bibêjim?
Min axeke sermest, barûte, tewtewe, eware, bêcir, şûm, serserî û bêbext dît. Min keleyeke nebûyî û herifî dît. Min nalenala axînê dît. Min keserkêşîya janê dît. Min fîxan û feryada hawarê dît. Min qiçîn, kelegermî û pêvedana kambaxîyê dît; min Girê Birîvayê û Deşta Tozê dît.
Ez bûm an çêbûm, ji sînga erda qelaştî pengizîm û ji esmanê bêban pekîyam. Ez bûm an çêbûm, ne bavekî tovê min avêt û ne dayîkekê avika hilkehilkê di zevîyê xwe de hembêz kir; ma ez ê çawa di malzorkekê de hilbêm lê! Ez qerase, telhîn, totirne û malêle. Ez nihîtê mêran, fîtê zilaman, deqê mêran, gayê pîr, dêwê dêwan, pilingê Meman û cencîhe. Ez destgurz, lepşêr û lepmelhêb. Ez pêdêw û pêhirç. Ez bêdev, bêziman û mit. Ez dilşêr. Ez dilzîz, dilbirehm, dilovan û dilhilûk. Ez bûm Boxeyê Birîvayê. Hilkişîyam ser gir, zûrîyam û min kir kastekast mîna guran.
Bihar e û xwezayê qama xwe arastiye; xwe bi xemil û xêzeke hezarrengî xemilandiye. Ez Boxeyê Deqorî -hefadê mêran, min xwe li keleha Silo Begê daye:
[Silo Begê, Xwedê jê hez kir, lawikê jinebîyekê bû; Xwedê teala dema dide yekî, nabêje tu lawê kê yî, tu kî yî, tu çi yî! Xwedê teala emirê wî wilo pê hebû.
Îcar qijle li Nisêbînê çêkir, ode bi qasî rojên salê tê de çêkirin. Xwedê hikim dayê û hikûmetê jê hez kir. Gava ew qijle lê kir, kevir li jor dinecirandin û zilam wekî dîlanê dikirin rêz, yekî dida destê yekî heta ku digiha destê hosta. Îcar boxeyekî wî hebû, wilo qarîşkirî bû, her sibeh derdiket û digot: "Box, box, box... ez boxeyê Silo Begê me, ez qaqibê eşîran im." Wê demê fezi'/suxre hebû, her rojê hinek dibirin suxreyê, mesele rojekê xelkê Amûdê dibirin, roja din xelkê Deqorîyan dibirin..hwd, yanî suxre jê re hat û ev qesr ji xwe re ava kir. Boxeyê Silo Begê jî her sibeh dikir boxebox û digot: "Ez qaqibê eşîran im, kî hebe bila serê xwe li hemberî min hilde."
Ev Evdile jî boxe ye. Kalikê Mecîdê Şêxmûskê gotê: "Evdile tu çawa yî? Welehî evê han guhên me qul kirin!" Evdile got: "Bi Xwedê ez birçî me!"
Di dema xwarinê de qerwane dihatin, qerwaneya her birekî xelkê başqe bû; mesele ya xelkê Amûdê başqe bû, a xelkê Tel Hebeşê başqe bû... Îcar wî ji zilamên xwe re got: "Binêrin, dema qerwaneya we hûn xelkê Deqorîyan hat, hûn nexwin, ji Evdile re bihêlin, bila Evdile bixwe." Dibêjin bi danê sibehê re, elokeke bimast ji wan re anîn, hemûyan got em naxwin bila Evdile bixwe, Evdile xwar, kalikê me Hisênê Elî gotê: "Ha Evdile, çawa bû?" Evdile zikê xwe leqand û got: "Weleh qorzîkek girt!" Yanî ber dilê wî piçekî girt û rabû ser xwe. Evê din hey boxbox jê tê; hema Evdile xwe lê girt -mirov gava ku diberize mirov, ji çavên wî xuya ye; ne wekî zarokên berê gava digotin: "Te noq ji min stand, nizanim te filan tişt li min kir!" Her duyan hev girt, Evdile ew di coka avê de da erdê û gotê: "Her sibeh boxboxa te ye, tu di nav eşîran re diçî û têyî, qey kesekî wekî te tuneye!!" Piştî ew ji ser rakirin, Silo Begê ji Evdile re got: "Tu çi kes î?" Evdile got: "Ez Deqorî me." Gotê: "Axayê te kî ye?" Got: "Mala Hisênaxa axayên min in." Rabû Silo Begê axayê Deqorîyan xelat kir û gote Deqorîyan: "Hûn ji vê suxreyê efû. Zilamekî wilo di nav we de heye, hema ji boyî xatirê wî, hûn ji vê suxreyê efû."]
Havîn e, havîna Deşta Tozê ye. Qiçîna nîvroyê ez wekî ava tirîyekî Midyadî givaştime. Havîn e û ez nû ji devê tava nûhişyar derketime. Zeraqa tavê avêtiye ser xaka me ya dûz lê Binxet hîn dergûşa Birîvayê kil dide. Rojê kirasê şevê çirandiye û êdî dinya wekî dilê dayîka min ron e.
Serdest hatiye ku xezeba xwe li bêxwedîtîya deşta min bibarîne, lê ez Boxeyê serpola- hûtê mêran, min boçika xwe bilind girtiye û wekî horsekî, min zend û bendên Kurdanî vemaliştine. Dikim sînorê xwe li qonaxa guleya hêza xwe deynim.
[Sînor:
Axa hat û got em ê sînorê xwe deynin. Zilaman nanê xwe xwar û rabûn ku sînor deynin.
Axa got: "Divê em tiştekî li ser sînor deynin, divê em sînor bi tiştekî nîşan bidin."
Kevirekî qerase wekî gomeyekî mezin li ber devê odeyê hebû. Tilîya xwe nîşanî Boxe kir û got: "Hema bila ev zilam rahêje vî kevirî!"
Zilaman got: "Law wê ev zilam çawa rahêje vî kevirî."
Tan li Boxe ket û got: "Niha ez vî kevirî rakim û li ku deynim, tu yê qebûl bikî?"
Axa lê nêrî ku zilamekî bi tena serê xwe ye, wê çilo rahêje vî kevirî?! Hema gotê:"Erê erê, ez ê qebûl bikim."
Dibêjin Boxe zend û bendên xwe çemandin û rahişte kevir, li milê xwe kir û çar zilaman da dû wî. Meşîyan û hey meşîyan heta ku rastî Gulîcayê bûn, ji xwe Gulîca jî erdê Birîvayê ye ha!
Dema ku gihan wir, Axê got: "Te di ca min nîyo, ma tu yê bibî ser bênderan?!"
Boxe gotê: "Ma ne te got tu kevir li ku deynî, ez ê sînor bigihînim wir!"]
Sal û zeman derbas bûn, îroj ez ji dem û dewrana xwe ketime; bayê stûxwarîyê her tişt biriye û barana berberîyê her tişt şûştiye. Esmanê şîn bi ser axa min de girt û xewna deşta min li nîvê çolistanekê teqinî.
Heger hat û we Deşta Tozê kir keleh; hûn ê sawera hespê min ê kumêt li fêza girê Birîvayê bibînin; jixwebawer û awirtûj.
Heger hat û we mala min ji hespê bêganeyan kir tewle, dê bejna min were xwarê û hûn ê bibêjin: "Xwezî çavên me birijîyana…"

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kultûrname

FÊRBÛNA ZIMANEKÎ

Zeynulabidîn Zinar

Ji bo ku meriv karibe bi Zimanê Kurdî yan bi zimanekî din bipeyive û pê binivîse, hin mercên bingehîn hene pêşî divî ew bi cih werin. Piştre êdî mirov dikare rind pê bipeyive û binivîse.

Hin ji wan mercan ev in li jêrê:

1- Divê meriv pêşî alfabeya Zimanê Kurdî rind bizanibe.

2- Divê meriv karibe fonetîka tîpên alfabeya Zimanê Kurdî bi lêv bike. Xasma jî dengê tîpa Ê, Î, U, Û, Q, X û Wyê derxîne.

3- Divê meriv zanibe Zimanê Kurdî ji kîjan şaxê zimanên dinyayê ye.

4- Divê meriv her roj bi qederê saetekê nivîsên kurdî yên cuda cuda bixwîne.

5- Divê her roj mirov çend peyvên kurdî yên pêdivî jiber bike, weke NAN, AV, SAVAR, PENÎR, ŞÎR û hwd.

6- Divê her roj meriv rûpelek A4 bi xameyê li ser kaxez bi kurdî binivîse û wê nivîsa xwe hilde, demek piştre dîsa derxe û bixwîne, ka çi guhertin di nivîsa meriv de çêbûye.

7- Divê meriv li her deverê û bi her kesî re bê fedî û şerm bi Zimanê Kurdî bipeyive.

8- Divê çu car meriv ji ber ku şaş bi kurdî dipeyive, fedî neke.

9- Divê meriv her roj bi qederê saetekê li radyo û televizyonên kurdî guhdarî bike û peyvên ku meriv jê fêm neke binivîse.

10- Dema ku meriv radizê, her şev di nava ciyê xwe de bi qederê 20-30 deqeyî fenteziyekê biafirîne û roja dî binivîse.

11- Divê hertim deftereke piçûk bi meriv re hebe û çi dema ku peyvek ji aliyê yekî ve hate gotin û mirov pê nizanibe, wê peyvê binivîse û piştre bipirse ka wateya wê çi ye.

12- Divê meriv çîrokên Folklora Kurdî pir bixwîne û şiroveya naveroka wan bike.

13- Divê meriv guhên xwe bide axaftina kurdên ku bi erebî, tirkî û farisî nizanin gava bi kurdî dipeyivin, ka ew çewa hevokên xwe ava dikin.

14- Dema meriv bi kurdî dipeyive, heta ku dest bide, divê meriv bêjeyên alecî bi kar bîne.

15- Dema mirov bi kurdî dipeyive, dive mirov ji nêv çarçoveya Çanda kurdî dernekeve.

16- Piştî ku ev xal bi cih werin, îcar dema ku meriv bi henek û pêkenokên xelkê yên bi kurdî keniya, hingê diyar dibe ku meriv rind fêrê Zimanê Kurdî bûye. Bi hêviya fêrbûna her kesê ku nizane bi Zimanê Kurdî bipeyive, her şad û serkeftî bin…

KARÎKATÊR

Kurdî Xweş e

Vekêşan انسحاب	Guman شك
Li dar xistin انعقاد	Bawerî عقيدة – ايمان
Danpêdan اعتراف رسمي	Guncaw مناسب
Pênase تعريف	Vebirî قطعي

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	S	O	Z	D	A	R	■	A	V
2	U	■	E	G	M	Î	■	L	A
3	L	A	L	E	■	■	D	Î	L
4	Ê	Z	A	N	G	■	■	K	A
5	M	A	L	■	W	Î	■	A	K
6	A	D	■	H	E	R	Î	R	I
7	N	Î	Ş	A	N	■	R	■	R
8	Î	■	A	R	■	T	E	L	I
9	■	■	D	E	S	T	D	A	N

Sitûnî

1-Kesê xwedî soz, bisoz – Ya ku mirov nikare ji bê wê bijî

2-Genî belavbûyî – Na bi erebî

3-Cûreyekî gulan e – Esîr

4- G+navekî jinan (Tev de vajî) – Bide min

5-Xanî – Cînavekeke tewandî – Bide min (Vajî)

6-Girav bi tirkî – Paşnavê helbestvanê kurd ê klasîk "Elî"

7- Sîmbol, şane

8- Agir – Hejmara 50 bi tirkî

9-Piştgîrî

ASOYÎ

1-Bajarekî Başûrê Kurdistanê

2-Serbestî

3-Safî – Kêfxweş

4-Deng belavbûyî - Keroşka mê ingilîzî

5-Qeratafa neyînîyê (Vajî) – Gewn belavbûyî

6-Mûyên ku li rûyê meriv şîn tên – Heman bersiv (Vajî) – Du tîpên wekhev

7- Dergeh (Vajî)

8- Palpiştî - Na bi erebî

9- Nehiştina avê di piyalê de

Amadekirina Xaçepirsê: Îsa Bavê Siwar

Sitêrname 10

Narîn Omer

Dema ku Eyşe Şan di malzaroka dêya xwe de bû, narvînê soz dabûyê ku ew bibe hevalcêwiya xem û kederan, da ku ew bi nemerdî qûnaxên jiyanê bişopîne. Ji ber vê yekê, ew bi hemî rengên jiyanê re sernoq bû û ji destpêka zayîna wê ta mirinê, rengên tarî her dem ew bêçare dikir.

Jînenîgariya Wê:

Hunermenda me di sala 1938'ê de li Amedê ji dayîk bûye. Malbata wê bi xwe ji Erzeromê ye. Çawa rengên jiyana wê cûrbicûr bûn, nav û bernavên wê jî wiha bûn:

Eyşe Şan, Eyşe Xan, Eyşana Osman, Eyşana Elî, Eyşana Kurd… lê paşê tenê bi navê Eyşe Şan hat nasîn.

Ew ji malbateke oldar û kevneperest e, lewra tevahiya malbatê biryara wê di warê sitranbêjiyê de qedexe kir û li dij daxwaza wê raweştiya. Tevlî vê yekê jî, dibêjin ku mala wê koçka sitranbêjî, dîlan û hunermendan bû. Her wiha tê gotin ku bavê wê bi xwe dengbêj û dengxweş bû.

Li ser navê wê û zaroktiya wê, mam Mele Elîyê Darî dibêje ku ewî û Eyşe Şan 3 salan bi hev re di xwendingeha "Darê" de xwendiye. Piştre wan ji wir bar kir û ew ji hevdu dûr ketin.

Eyşe Şan di sala 1958'ê de sitran bi awayekî eşkere gotiye, lê ji ber ku malbata wê ev tişt lê qedexe kiribû, bavê wê zor lê kir ku ew bi mêrekî xwedî jin û temenmezin re şû bike ku navê wî "Şewket Boran" bû…

Ji ber vê yekê şûkirina wê berdewam nekir, tevlî ku keçikeke wê jî jê hebû. Berê xwe dide bajarê Êntabê û bi alîkariya "Nayilê Bayso" di êzgeha bajêr de sitranan bi zimanê tirkî dibêje. Paşê berê xwe dide bajarê Istenbolê û tevlî ku zimanê kurdî qedexe bû jî, lê li wir bi zimanê xwe yê kurdî jî distirîne.

Diyar bû ku dengê wê li ser karmend û berpirsyarên kaset û sitranên wê fala xêrê bû; ewan kesan qezenceke mezin di warê firotina kaset û berhemên Eyş Şanê de bi dest xist. Mixabin, ew merivine kedxwar û çirûk bûn, nirxê keda wê dixwarin û tu tişt nedidanê, ji lew re ew zîvar û hejar dijiya.

Ji ber ku ewê sitranên xwe bi kurdî digotin, êdî desthilata Tirkiyê zordarî lê dikir û astengî jê re çêdikir. Ji ber vê sedemê, Eyşe Şan di sala 1972'yê de direve û berê xwe dide welatê Elmanyayê û li bal keça xwe dijî. Lê qedera giran dîsa lê diqulibe û bang li mirinê dike ku canê keça wê ji cendik bikişîne, da ku Eyşe Şanê di dewrana êş û derdan de bizîvirîne û bêçare bihêle. Ew keseke bêcan dimîne, bilûra bextreşiyê kulîlkên dilê wê ji xemgîniyê diçirmisîne.

Piştî vê jana giran, car dî ji Elmanyayê vedigere welêt.

Di sala 1978'ê de xewna xwe ya herî mezin pêk tîne û seredana Başûrê Kurdistanê dike. Ji aliyê hunermendên wekî: Îsayê Berwarî, Mihemedê Arif, Nisrîna Şêrwan, Tehsînê Taha...û ji aliyê gelê kurd ve bi dilsozî û şadîmanî tê pêşwazîkirin. Ev rengê pêşwazîkirinê, ji wê re dibe mîna bawername û xelateke zêrîn; dil û ramanên wê geş û xweş dike.

Li Başûr çend konsert û ahengan li dar dixîne û di Radyoya Bexdê - Beşê Zimanê Kurdî de çend sitranan tomar dike. Ev seredan jê re dibe navgîneke hêja ku bi rêya wê kar û xebata wê ya ji bo gelê wê, di bîrdnaka dîroka kurdî de mayînde bimîne.

Sitranên Eyşe Şanê:

Tişta ku hunermenda me ji hemîyan vediqetîne ew e ku di folklor û kevnetorê me de, (çi seryelî, çi dîlan û şehyan be) gotin û awazên resen gotine... Ew ciyawaziya wê ji kû hatiye? Ji ber ku gelek hunermend û dengbêj li mala bavê wê şevbuhêrk diqedandin û hetanî berbanga sibehê ji dest hev digirtin; Eyşe Şanê bi xwe jî hişyar dima û bi baldarî li wan guhdar dikir. Her wiha di zaroktiya xwe de, di civatên jinan de jî sitraye.

Eyşe Şanê ji civak, jin, mêr, dê, welat, xak û siuşta Kurdistanê re sitraye. Her wiha ji bêrîvan, şivan, bêzar, xemgîn, dilşad û dildaran re jî sitraye.

Eyşe Şana dilsoz, rojên jiyana xwe dike qurbana doza jinê û bo lipêşxistina huner û folklora kurdî.

Mixabin, ew di tenêtiyê de dijiya û di 1996'ê de, bi tena xwe çavên xwe bi yek carê girtin û xatir xwest.

Eyşe Şan... Nalîna Sitrana Kurdî

Peyva Windayî

Da ku tu peyva windayî bibînî, van navan bi awayekî sitûnî xêz bike:

Kokperest – Dûr – Akam – Dê – Aso – ajal – Agahdar – Aşbûn – Avûba – Aloz – Asan – Berhevdan – Bername – Alastin – Berdan – Bestbêj – Beste – Pexşane – Beşkar – Berpal – Beşgeh – Alode – Bedguman – Birêved.

Peyva Windayî ji 9 tîpan pêk tê, ew jî navê bajarekî Rojhilata Kurdistanê ye.

A	G	A	H	D	A	R	A	V	Û	B	A
B	I	R	Ê	V	E	D	I	A	S	A	N
A	L	O	D	E	N	B	E	Ş	G	E	H
B	E	D	G	U	M	A	N	S	A	S	O
B	E	Ş	K	A	R	B	E	R	P	A	L
P	E	X	Ş	A	N	E	R	A	L	O	Z
B	E	S	T	B	Ê	J	B	E	S	T	E
A	L	A	S	T	I	N	Ê	A	J	A	L
K	O	K	P	E	R	E	S	T	D	Û	R
A	Ş	B	Û	N	C	B	E	R	D	A	N
B	E	R	H	E	V	D	A	N	I	D	Ê
B	E	R	N	A	M	E	D	A	K	A	M

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	M	E	H	A	B	A	D	■	M
2	A	M	E	D	■	M	A	S	Î
3	R	R	R	■	■	Û	R	U	D
4	D	Î	■	M	I	R	Î	■	Y
5	Î	K	Î	■	■	■	N	M	A
6	N	A	N	K	O	R	■	E	T
7	■	■	K	A	L	I	K	■	■
8	M	E	■	M	■	M	A	K	O
9	E	M	R	A	L	Î	■	K	O